

#Coronavirus

Korona: Pêwîst e em çî tiştan derbarê vê vîrûsê li Bêrlînê bizanin?

Hejmara kesên tûşbûyî bi Vîrûsa Koronayê li Ewropayê her ku diçe zêde dibe. Kiryarên niha bala xwe didin ser kêmkirina leza belavbûna Vîrûsa Koronayê. Her çiqasî hejmara kesên ku hevdem tûşî Vîrûsa Koronayê dibin, kêmtir be, dê dermanekî baştir bo kesên bi nexweşiya giran were raberkirin.

Vîrûsa Koronayê çawa tê veguhestin? Hûn çawa dikarin xwe biparêzin?

Vîrûsa Koronayê dikare ji kesekî bo kesê din were veguhestin. Bi mebesta kêmkirina xetera tûşbûnê, kiryarên têkildarî tevahiya nexweşiyên bi kêmgirtin, derbarê Koronayê jî kêrhatî ne: Destên xwepaqij ragire û ji kesên nexweş dûr bibe. Zanyarî di çarçova gellek ji zimanan jibo hemî bikarênerên bicihkirina penaberan li Bêrlînê hatine şandin.

Heke we heta niha ev zanyarî nedîtine, wek mînak di destavxaneya hevpar de, ji kerema xwe wê yekê daxwaz bikin! Veguhestin bi riya xwareka ji der-kirî û kelûpelên din ên ji der-kirî wek pêlîstokan hîn nehatiye piştrastkirin. Li gorî agahiyên niha yê zanistî, vîrûs ji heywanên kesî bo mirov û an ji riya mirov bo heywanên kedî nayê veguhestin.

Nîşaneyên Vîrûsê çî ne?

Kuxîn, pozê şilavî, êşa gewrî û Ta: Tûşbûna bi Vîrûsa Koronaya Nû dikare van nîşaneyan diyar bike. Hinek ji nexweşan tûşbûna bi Vijik anku Izhalê ragihandine. Her wiha îmkana qewimîna kêşeyên bêhnkişandinê û Êşa Zirav (Zaturiye: pneumonia) jî heye. Ev nîşane pirrî caran weke nîşaneyên nexweşiyên qerisîn (Zekem) û Flûyê ne.

Tûşbûna bi vê vîrûsê jibo kîjan koma mirovan bitalûketir e?

Heta niha, çar babet ji her pênc babetên nexweşiyê kêmbandor bûne. Di hinek ji nexweşdan de, vîrûs dikare bibe sebaba nexweşiyê giran hevrê digel kêşeyên Bêhnkişandinê û Êşa Zirav (Zaturiye). Kesên extiyar û salmezî (derdora 60 salî), kesên cigareyê dikîşînin û kesên tûşbûyî bi nexweşiyên dil (nexweşiyên pişikê) zêdetir dikevin bin bandorê. Gellek girîng e ku xetera tûşbûna bi nexweşiyê li van komankêmbibe. Loma girîng e ku: Destên xwe bişû, navbira xwe digel kesan zêde bike û danûstandinên xwe yê civakî kêmbike.

Heke ez gumanbarê bi tûşbûna bi Koronayê bim, divê çî bikim?

Hemî kesên ku bi kesekî ra di têkilliyê de bûne ku tûşbûna wî/ê li ceribîngehê hatiye piştrastkirin, divê bilez bi riya telefonê digel bijîşk an ofîsên têkildar (wekmînak 'Charité' li Mitte, Wenckebach-Klinikum Tempelhof, DRK Klinik Westend) bikevin têkilliyê. Ji kerema xwe seredana bijîşkê malbata xwe li odeya çaverêtiyê neke! Heke tu nikarî bi zimanê Almanî biaxivî, ji endamekî malbata xwe alîkariyê werbigire!

Metirsiya tûşbûna bi vîrûsa Koronayê li Almanyayê çiqas e?

Asta metirsiya giştî pêka tendurustiya civakê li Almanyayê di dema niha da wek 'bilind' hatiye ragihandin. Gengaziya nexweşiyên girtan di kesên salmezî û extiyar û kesên ku ji pêşve kêşeyên tendurustiyê hene de zêdetir dibe.

Gelo derbarê kêmbûna xwarekê li Bêrlînê nîgeranî heye?

Heta heke hîç berhem û xwarekek li nav refên firoşgehan nemabe: Hîç kêşeyek derbarê dabînkirina xwarek û berheman tune, hema wisa dabînkirina xwarekê tê misogerkirin. Şol û karan soz dane ku bersiva zêdebûna daxwazê bidin.

Rêwiyên ku ji navçeyên li ber xetera tûşbûna bi Vîrûsa Koronayê vegeyriyan, divê çî cûre xalan berçav bigirin?

Kesên ku têkilliya wan a nêzik digel wan kesan hebûye ku tûşbûna wan bi Vîrûsa Koronayê li ceribîngehê hatiye piştrastkirin an li navçeyên li ber metirsiyê bûne, divê digel kesên din nekevîne têkilliyê. Ev kes divê derdem digel beşên tendurustiyê yê têkildar bikevin têkilliyê. Hin mînakên navçeyên metirsiyê Îtalya, Îran û hin beşên Australyayê ne.



20.03.2020
www.berlin.de/corona

be Berlin